



Mîr Celadet Bedirxan (1893-1951)

Mîr Bedirxan ji mîrekên dawî yên herêma botanê bû . Bedirxan bavpîrê Celadete. Bavê Celadet Emîn Alî Bedirxan ji du jinên Çerkez zewicî .Celadet ji ya biçke bi nave Snîhe di 26-4-1893 a Li bajarê Îstenbolê hatiye dinê.Emîn Alî Bedirxan ji sedemên ku xwedan bîr û hastên netewî bû

Osmanyen hesab jê dikir herdem li sorgon û der bi der bû.tevî ku durî welatê xwe bû nikarîbû biçu Kurdistan , bi şeweyekî dîtir Kurdistan tanî civat û cîhê lê dima.çîrokbêj û dengbêjên navdar dikirin mêvanê mala xwe. da ku zarokên wî durî hest û çanda kurdwerî nemînin.Emîn Alî bedirxan ,ji hêleke dîtir zarokên xwe fêrî zimanê biyanî dikirin,weke Yûnanî ,Rûsî,ferensî,Ingilîzî... meşa Celadet bi bavê xwe re bigir ji bajêrê tirkan ta libnan ,Filestîn û sûriya , bandorek mezin di kesayetya wî de afrand eve di temênê wî yê xwendina seretayî de.Celadet ji zanîngeha herbî weke serbaz derket, Di nav salên 1917 an de.piştî hatina contirkan bi serkêşya Mistefa Kemal sala 1922 a rewşa kurdan hîn diwartir bû.ferma li ser fermanê bi kuştina kesên muxaleftekir dihate sitandin.yek ji wan kesan Mîr Celadet bû .vê yekê hişt ku Celadet turkiye berde û biçu Elmanya,li wir dest bi xwendina mafwerî kir ji serdemêa mirina bavê vegerya Misrê eve di sala 1926 a bû.piştê çû bajarê Beyrûtê.ji ber şikestina şoreşa Şêx Seîd ,komeke rewşenbîr û welatparêz û di navwande Mîr Celadet di 15/2/1927 a de rêxistina (xoybûn) damizrandin bi gelemperî li qadên Beyrût suriye û rojavayî Kurdistan ji xwere dikirin bingeh, û amedekirina pingavekê ji bo vegera welêt dikirin.

1930 bi tevgera şoreşa Agirî ,celadet amedekarî ji bo tevlêbûnê kirin belam şoreş şikest û bi tevayî serdarê wê berê xwe dane Îranê .Celadet jî bi wan re.şahê Îran rêçên siyasî û rêxistinî ji ber wan girtin .ji ber wan astengan Celadet berê xwe da

Îraqê û ji wir dîsa vegerya Sûrî.di wê demê de ji ber têkilyê ferensya bi tirkan re, kar û çalakyên rêxistina Xoybûnê li başûr rojavayê kurdistanê qedexa kirin,ferensiyan Celadet sorgonî Şamê kirin ji vir û şûnde istisyona Celadet ya ji bo zimanê kurdî û çapemenyê dest pêkir. Mîr di ezmûna kar û xebatên xwe de ghişta baweriyek bê gûman ku sedemên mayina gelê kurd di bi nîrê dagirkerî û hejaryê de cehalete.ango kurd ji nan bêtir hewcedarî nasîn û zanîna ne. ji bo ku ev pêk were divabe kurd pêşî bi zimanê xwe zanibin bixwînin û binivîsin. Celadet li ser vê baweriyê dest bi kar û xebatên çand û zimanê kurdî kir, alfaba xwe ya ku di sala 1919 an de amide kiribû xiste piratîkê.yekem car di 15/5/1932 a ev alfaba di kovara Hewrê de bi vê alfabayê hate çap kirin û -57- jimarên xwe temamkirin, ta sala 1943 a .li pey wê rojnama Ronahî 1/4/1942a bi-28- jimarên xwe ta sala 1945 a .ji bilî van herdû kovaran û mijarên dîtir, Celadet pirtûk û berhemên hêja li pey xwe hiştin.

1-rêzana alfabaya kurdî

2-rûpelin elfabayê

3-nivêjîn yezîdya :dîbace

4-mektûb bi Mistefa Kemal paşa re

5-ferhenga kurdî

6-elfaba kurdî

7-giramêra kurdî(bi zimanê ferensî)

8-ferhenga kurdî ferensî

9-xwe binas

10-kitêba Sînem xanim

11-meselên Kurdistan

12-Edirne skotnan 1939 çapxana Îstenbol

13-bîbşa pêximber bi kurdî û dumilî

14-doza kurd bi erebî û ferensî hatiye weşandin di bin navê Belec Şêrgo.Ji bilî van berheman jî, Celadet xwedan hestekî tenik bû ji hêla helbestê de ,hin helbestên bi mijarên cûr bi cûr ji pirtûka kurdîre hiştin .di bin pir navên xwestî (mustear)de wek Herekol ,bavê Cemşîd û Sînem xanê,hewar ,Ronahî, şîretvan ,Bişarê segman,Şevger...

Mîr Celadet bi keçmama xwere Rewşen Salih Bedirxan re zewicî û bû bavê du zarokan ,Sînem û Cemşîd.

Celadet jiyana xwe ya piştî tevgera siyasî û têkliyê wî bi serhildanan re, bi tevayî li bajarê Şamê bûrand. Bi xebat û lêkolînên li ser çanand û zimanê kurdî ta 15/7/1951 ê ,mîr li gundê Hêcanê nêzîkî Şamê li ser devê bîrekê weke hate gotin bi kumişîna bîrê jiyana xwe ji destda ,di bawerya hin kesan de şik û guman di derbarê vê qedera tareî de hene ku destên tirkan di çêkirna vê qederê de hebe.Celadet nemir û namire...wê her û her di nav gelê kurd de bimîne heya ku hebin ev wîneyên dengdariya zimanê kudî û çanda kurdan...

Çavkanî:

-Kovara nûdem jimara 25 an

-Celadet Bedrxan û şier –Azad Mizorî-çapxana siprez